



Gangmasters &
Labour Abuse Authority

Kurdish



MAFÊN Kargeran

Parastina kargerên bêparêz
û kedmijandî

Mafên we yên kar

Wekû karmendek mafên we ji hêla zagonên Şanişîna Yekbûyî (UK) tên parastin. Hin maf çewa kû hun dest bi kar bikin dikeve pergale, hinekî din bi vê yekê girêdayî ye ku we çend wext kar kiriye. Ev beş vî tiştî rê we dide ku divê hun çî hêviyê ji xwediyê karê xwe bikin. Evana mafên we yên zagonî ne.

Meaşê asgarî ya neteweyî

Eger karek we yê daîmî hebe an peymanê we kurt wext be an jî hun jibo ajanseke kar bikin, perê here kêr ku divê hun bi dest bixin meaşê asgarî ya maqûl e. Ev yek li gor temenê we mimkun e Meaşê Asgarî yê Neteweyî (NMW) be an jî Meaş iyanê yê Neteweyî (NLW) be.

Eger hun 'perê perçe perçe' distînin (mînak: bi qandî hejmara perçeyên ku we temam kiribe, dabe ser hev...hwd.) Hun disa divê meblexekî herî kêr bi qanda meaşê asgarî yê guncan bistînin. Kesên xwedan karê xwe ne û kesên bi dlxwazî dixebitin jî di nav de çend heb îstîsna hene.

Ji bo zanyariya bêhtir derheqê bihaya meaşê jiyane û meaşê asgarî here ser **GOV.UK** û jibo '**NMW**' lêgere.

Seetên Kar

Mesaiya zêde jî di nav de nabe hun bête mecbûr kirin ku bêhtirî 48 seetan di hefteyekî de bixebitin. Tenê dema hun bixwe vî tiştî hilbijêrin ev nabe pirsgirêk.

Mafê jibo herî kême heftê rojê an du heftê du roj li ser hev betlane bikin. Eger hun di rojê de bêhtirî şeş seetan kar dikin divê hun bêhnvedaneke herî kême 20 deqeyî bigrin.

Betlana Salane

Ji roja ku we dest bi kar kiribe mafê we yê betlaneyê yê herî kême ji bo çend hefteyan jî hêla zagonan ve hatiyê dayîn. Ev yek hem ji bo karmenden niv wext e û hem jî ji bo yê ku peymanan wan heta wextekî diyarkî ye. Ji bo zanyariyên herî nû li ser malpera **GOV.UK** yê, '**pay and work rights**' (mafên kar û meaşan) lêbikole.

Wirdekarîyên mafê we yê betlaaneyê divê di peymanan we ya kar de hebe. Ev yek girêdayî seetên we yê kar e (jibo karmendên niv wext jî li gor seetê wan e) seetên betlaneyê ku di wextê kar de hatibin ser hev divê li ser bihaya karê we yê normal bê hesabandin û heqê wê bê dayîn. Mafê xwediyê karê we heye ku biryar bide hun çî wextî betlane bigrin eger kêşeyên we ji hela girtina îznê hebe li GLAA yê bigerin.

Dema hun dev jî kar berdîn betlaneyên ku hatine ser hev û nehatine bikaranîn divê wek pere bê dayîn. Eger xwediyê karê we nahêle ku hun betlane bikin an deynê we yê perê betlaneyê lê ye hun dikarin peywendî bi Acas Helpline (Xeta Alîkariyê ya Acasê) an jî bi Citizens Advice (Şewirmendiya Hewwelatiyan) re bigrin. Ji bo dîtina hejmarên telefonê yê zêdetir li **www.gla.gov.uk/contacts** binere.

Bordroya Meaşê ya Dabeşkirî

Divê roja ku perê we bê dayîn hun meqbûzekê bistînin ku hem meaşê we yê brut hem jî yê ku ji we re dimîne nîşan bide. Ev yek dikare hem çapkirî be hem jî elektronîk be. Divê meblexên ji meaşê we hatiyê kuştin û sedemên wê tê de binivîse.

Jêkişiyên wek bac an National Insurance (Sîxorteya Neteweyî) mimkun e her hefte biguhere û divê li ser her meqbûzan bê nivîsandin. Divê meaşê tê yê peymankirî di wextê xwe de bê dayîn û her cûre betlane an perê nexweşiyê jî di nav de be.

Jêkişiyên Meaşan

Xwediyê karê we tenê dikare jêkişiyên dîyarkirî ji meaşên we bikuje û ev yek divê li ser meqbûza meaşê bê nivîsandin. Divê her wext piştî ku jêkişî jê bîn kuştin 'meblexa net' li ser meqbûzê bê nivîsandin.

Hin jêkişî weke bac û beşa Sixorta Neteweyî yasayî ne, û dibe kû we li ser yê din di peymana kar de li hev kiribe, weke cîhê mayîne û hatuçûn. Ji kerema xwe bizanin ku mimkun e hin jêkişiyên ku li ser mezbûzê dinivîsin yasayî nebin. Eger hun dilnîya nînin bi GLAA yê re control bikin.

Heta eger we li ser jêkişiyêke li hev kiribe ew nabe meaşê we têxe bin meaşê asgarî, ji bilî meblexeke diyarkirî jibo cîhê mayîne. Ji bo zanyariyên bêhtir li ser malpera **GOV.UK** yê, **'pay and work rights'** (mafên kar û meaşan) lêbikole.

Tendirustî û ewlekari

Xwedî karê we li cîhê kar berpirsiyarê yasayî yê tendirustî û ewlekariya we ye. Dema ku pêwîst be hun divê hun zanyariyên li ser tendirustî û ewlekariyê, perwerdehiyan, cil û bergên parêzarî û her guhartineke pêwîst, bêpere werbigrin.

Perê nexweşiyê

Peymana we ya kar divê bêje ku eger hun ji ber nexweşiyêke neçin ser kar çê pereyek bê dayîn. Di Şanişîna Yekbûyî meblexa herî kêr ku hun dikarin werbigrin Perê Nexweşiyê yê Yasayî (SSP) ye. Ev yek dema ku hun li pey hev çar rojan an zêdetir durî kar bin tê hesabandin. Dibe ku peymanaya we di rewşên din de perê an fêdeyên zêde bide we.

Şert û mercên we

Ev peymaneyeke di navbera we û xwediyê karê we de ye. Li gor zagon, eger we ji mehekê zêdetir kar kiribe divê wirdekariyên nivîsî yê şert û mercên we bê dayîn.

Divê di nava du mehên ku we dest bi kar kiriye şert û mercên we yê nivîsî bigihêje destê we, û divê ev zanyarî têde hebin :

- Navê we
- Kesê ku hunê jê re kar bikin
- Cûreya karê ku hunê encam bidin
- Dîroka ku we dest bi kar kiriye
- Cîhê karê we
- Bihaya meaşê we û cûreya dayîna meaşê (hefteyane and mehane)
- Seetên Kar
- Mafên betlaneyê
- Mafên perê nexweşiyê
- Îcraatên dîsîplînê, ji kar derxistinê û yê giliyê.
- Agahiya ku hun divê dema bişûndekişandinê bidin û ya ji kar derxistinê

Xwediyê karê we tenê dikare şert û mercên peymanê we bi îzna we biguherîne.

Bi me re peywendî bike



Gangmasters & Labour Abuse Authority

PO Box 10272, Nottingham, NG2 9PB

www.gla.gov.uk

Îmeyl: **intelligence@glaa.gsi.gov.uk**



+44 (0)345 602 5020

Xeta agahîdayîn ya belaş û bibawer:



0800 432 0804

Ji bo alîkariya bêhtir biçe **www.gla.gov.uk/contacts**



Gangmasters &
Labour Abuse Authority



UNIVERSITY
of DERBY

Dabînkera mesrefên belavokan:

Akademiya GLAA yê

bi hevkarîya

Zanîngeha Derby yê



Derheqê GLAA yê

Gangmasters & Labour Abuse Authority (GLAA) saziyeke ku ji bo parastina kargeran dijî kedmijiyê hatiye damezrandin.

Em ji vekolerên taybet yên ku dikarin ji pirsgerêkên kargeran, ji kêma dayîna meaşan heta xebitandina bi zorê yên girêdayî bazirganiya mirovan û cûreyên din yên koletiya modern, fehm bikin, îstifade dikin.

GLAA xwedan planeke bihêz e ji bo ruxset dayîna 'şirketên sereke' û kesayetên ku kargeran peyda dikin da ku di sektora teze ya hîlberîna Şanişîna Yekbûyî cihê xwe bigrin. Ev yek, cotyariyê, bexçewaniyê, masîvaniyê û hemû îcraatên têkildar û paket kirinê jî di nav xwe de dihewîne.

Hemû kesên xwedan ruxset divê hin standartên dijwar yên ruxset dayîne bi cîh binin. Peyda kirina bêyî ruxset ya kargerên demkî ji bo cûreyên kar ku li jorê dinivîsin sûc e û dibe ku bibe sedema zindanî kirina herî zêde 10 salan. Herwiha danûsitendin ligel peydakerên kargeran yên bêruxset jî sûc e. Cezayê vê yekê herî zêde şeş meh e.

Ji bo rawestana kedmijiya kargeran alîkarî bikin

Ji bo ku em mafên we biparêzin û dilniya bin da ku hun di bin şertên yasayî de dixebitin pêwîstiya me bi alîkariya we heye. Eger hun difikirin ku hun weke pêwîst, adil û yasayî nehatine muamele kirin ji kerema xwe re peywendî bi me re bikin.

Em nkarin bêyî agahiya we alîkariya we bikin

Hun dkarin:

- Li **0345 602 5020** yê bigerin (vebijarka 2), bi me re yekser biaxivin- Dûşem ta În, 9 ê sibehê ta 5 ê êvarê (wegerên me hene)
- Îmeyl **intelligence@glaa.gsi.gov.uk**
- Li ser hejmara **0800 432 0804** Li xeta agahî dayîna me ya bibawer BELAŞ bigerin
- Li ser rêya malpera me ya înternetê zanyariyan parve bikin **www.gla.gov.uk**
- Ji adresa, GLAA, PO Box 10272, Nottingham, NG2 9PB jibo me binivîsin

Eger hun dixwazin mafên xwe yê kar bi şewirmendekî xwedan tecrûbe re nîqaş bikin bi Citizens Advice Bureau (Mekteba Şewirmendiya Hevwelatîyan) ya herêmi and bi ACAS Helpline (Xeta Alîkariyê ya Acasê) ê li ser hejmara on **0300 123 1100** peywendî bigrin.

Standartên ruxset dayînê yê GLAA yê

Li gor zagonên Şanişîna Yekbûyî xwediyê karê we mecbûr e kargeran li dijî kedmijî û muameleya nebaş biparêze.

Heman zagon mafên din jî dide we. Ev yek têkildarî tiştên weke:

- Meaşê we- divê hun Meaşê Asgarî yê Neteweyî bistînin
- Perê betlaneyê ku hun distînin
- Şert û mercên peymanê we
- Dirêjbûn û çendcarî bûna wextên bêhnvedanên we
- Li ser kar şêweya muamele kirinê bi we re
- Parastina tendirûstî, başî û ewlekarî we bi rêya birêvebirineke we ewle dihêle û dema pêwîst be alavên ewlekariyê dide we
- Eger ji hêla xwediyê karê we tê dayîn standartên cîhê mayînê û hatûçûnê

Standartên ruxset dayîna GLAA yê – îdame

Heman maf ji hêla standartên girêdayî ruxseta GLAA yê jî tîn parastin.

Eger hun ji bo karên weke cotyariyê, bexçewaniyê, masîvaniyê û hemû îcraatên têkildar û paket kirinê hatine dabîn kirin divê xwediyê karê we xwedan ruxseteke derbasdar be.

Eger hûn bi fikarin ku hin kes bêyî ruxset vî karî dikin an pêdawîstiyên yasayî bi cîh nayînin ji kerema xwe re bi GLAA yê re peywendî bigrin.